Hawar
Rojnameya Rojane
23 Gulan 2009
Şemî
Sal: 1
Hejmar: 18
Buha: 50 Kr

## KESK û TTB: DTP muxataba pirsgirêkê ye

Piştî hevpeyvîna rojnameger Hasan Cemal a bi Serokê Konseya Rêveber a Koma Civakên Kurdistanê Murat Karayilan re li Tirkiyeyê nîqaşên ji bo çareseriya pirsgirêka kurd ketin rojevê. Saziyên civakî dê ji bo çareseriyê bi partiyên siyasî re hevdîtinan çêkin û dê bêjin muxataba pirsgirêkê DTP ye. Piştî nîqaşan gelek saziyên civakî yên wekî KESK, DÎSK û TTB ji bo hevdîtina têkildarî mijarê randevû ji Serokomar, Serokwezîr û partiyên siyasî xwest.... RÛPEL - 4



### JI BO 1'Ê HEZÎRANÊ BI TENÊ HEFTEYEK MA

# 'Agirbest yekalî nameşe'

**Serokê Konseya Rêveber a Koma Civakên Kurdistanê Murat Karayilan ji rayedarên tirk xwest ku dev ji gotinan berdin û ewil operasyon û êrîşan rawestînin. Karayilan da zanîn ku heke dewlet êrîşan ranewestîne dê agirbest bi awayekî yekalî nemeşe**

Karayilan ji ANF'ê re axivî, bal kişand ser biryara bêşerî ya heta 1'ê hezîranê û got ku, wan tiştên pêwist kirine, niha top di destê Enqereyê de ye. Karayilan hevpeyvîna rojnamevan û nivîskar Hasan Cemal bi wî re pêk anîbû wekî rojnamevaniyeke baş nirxand û got ku, ji ber fikra şerê psîkolojîk nêz nebûye, raya giştî der barê fikra wan de agahdar bûye. Karayilan bal kişand ku li cihekî ku aliyek bi tang û topan operasyonan pêk tîne, aliyek nikare agirbestê bidomîne û wiha got: "Divê beriya her tiştî êrîşên li ser gel, li dijî saziyan û operasyonên leşkerî bêne rawestandin."

### 'JI BO 1'Ê HEZÎRANÊ KÊM MA'

Karayilan ji ber operasyonan rêveberiya tirk bi zimanekî tund rexne kir û ji windahiyên demên dawî ji rayedarên tirk berpirsyar girtin. Karayilan bi bîr xist ku wan biryara bêçalakitiyê heta 1'ê hezîranê girtiye û got: "Ji bo 1'ê hezîranê hefteyek ma. Divê ev roj baş û rast bên nirxandin û gavên pêwist bên avêtin."


### 'DIVÊ AGIRBEST DUALÎ BE'

Karayilan got wan berpirsyariya xwe bi cih aniye û gava pêwist avêtiye. Karayilan wiha got: "Heta niha, nêzî 20 gerîlayan jiyana xwe ji dest dane. Heke bi rastî hikûmet çareseriyê dixwaze, divê demildest operasyonan rawestîne. Heke operasyonên tunekirinê dewam bikin, dê ev yek wisa dewam neke. Jixwe agirbest yekalî nameşe."

# Li ber çavê zarokan îşkenceya çawiş

**Zext û zora rayedarên dewletê, leşker û polîsan a li hemberî zarokên kurdan didome. Vê carê jî çawişekî pispor bi cilên xwe yên leşkerî bi ser dibistanê de girt û xwedekarekî biçûk da ber sîle û pehînan. Dîmenên lêdanê bi telefoneke destan hatin qeydkirin**







### BI CILÊN LEŞKERÎ AVÊT SER DIBISTANÊ

Kurê çawişê pispor O.A yê di pola 7'emîn û M.B'ê pola 6'emîn dema bi topê dilîstin pev çûn. Mamoste ketin navberê û zarok ji hev veqetandin. O.A bûyer ji bavê xwe yê çawiş re got. Çawiş bi cil û bergên fermî çû dibistanê û zarokê biçûk M.B ji polê derxist û li ber çavê mamoste û xwendekaran li wî xist.

### LI KORÎDORÊ LÊDANA HOVANE

Çawiş zarok ji dersê derxist ji derve û li korîdora dibistanê da ber pehîn û mistan. Çawişê bêînsaf serê M.B. li dîwaran xistiye. Li ser qîre qîra M.B. mamoste û xwendekarên ji dibistanê derketin M.B. ji destê çawiş derxistiye. Piştî M.B. rakirin nexweşxaneyê polîsên hatin dibistanê girtîname girtin.

### MALBATÊ SERÎ LI DOZGERIYÊ DA

Bavê M.B Abdullah B, bertek nîşan da û wiha behsa bûyerê kir: "Dema ez çûm emniyetê kurê min ji nexweşxaneyê dianîn. Dev û rûyê wî di nav xwînê de mabû. Ka çawa dibe ku mirovek bi cil û bergên fermî bi ser dibistanê de bigire û li xwendekar bide? Min dîmenên lêdanê jî wekî delîl dan dozgeriyê."... RÛPEL - 3

## Ji Edîtor

### Peyva 'hovîtî' jî rewşê venabêje

Zarokên kurdan pêşeroja kurdan in û bi van êrîşan dixwazin pêşerojekê li kurdan tarî bikin. Ji bo hêzên dewletê êrîşî zarokên kurdan bikin, pêwîstî nîn e ku di destê wan de kevir jî hebe. Êdî şik û guman tune ye ku dewleta tirk a bi hemû hêza xwe bi êrîşên li hember zarokên kurd ketiye nava helwesta tolhilderiyê.

Zarokên kurdan tên gulebarankirin, îşkencekirin û bi dehan salan ceza li wan tê birîn. Hêj di hafizeya me tevan da taze ye ku çawa li Colemêrgê tîmên taybet zarokê kurd Seyfî Turan bi çi çavsoriyê birîndar kir.

Duh jî li Amedê Çawişekî Pispor bi ser dibistanê de girt û zarokê xwendekar ê bi kurê wî re pev çûbû di lêdaneke dijwar re derbas kir. Kesekî ku şahîdî ji bûyerê re kir bi kişandina dîmenên bûyera sosret mijar kete rojeva çapemeniyê.

Navlêkirinên heta niha yên mîna çavsorî û hovîtiyê jî têrî rawekirina rewşê nakin. Tu kes nikare vê mijarê mîna mijareke ji rêzê ya pevçûna du zarokan û helwesta bavekî binirxîne. Ev tenê û tenê çavsoriya hêzên dewletê ya li dijî zarokên kurd e. Ev ji dijminatiyê jî wêdetir tevgera hestên mirovên ji bo kuştinê hatine perwerdekirin e.

Kesên ku li bersiva 'çima zarokên kurdan keviran diavêjin hêzên ewlekariyê' an 'Çima ciwanên kurdan berê xwe didin çiyan?' pêwîst e bersiva van pirsan bidin:

✓ Gelo ev zarokê ku rastî vê çavsoriyê hatî, dê karibe heta dawiya temenê xwe ji bandora vê bûyerê rizgar bibe?

✓ Gelo zarokên din ên li dibistanê ji bûyerê re şahidî kirin, dê vê bûyerê ji bîr bikin?

✓ Malbatên zarokên kurd dê çiqasî karibin bi dilekî rehet zarokên xwe bişînin dibistanê?

✓ Mamosteyên ku nikarin zarokên emanetî wan hatine kirin biparêzin dê çawa nifşekê nû ji jiyanê re amade bikin?

✓ Waliyê Amedê, Wezîrê Karê Hundir piştî van dîmenan gelo dê bi ser mijarê de biçin an jî dê dîsa ragihandinê û kesê dîmen kişandiye bi hevkariya PKK'ê sûcdar bikin?

✓ Gelo rojê çend bûyerên bi vî rengî li gund, bajarok, navçe û taxên bajarên Kurdistanê û bajarên Tirkiyeyê pêk tên?

# Dîsa Sakarya dîsa lînc...

### Cenaze nedan malbatan

Li Dihê di pevçûnekê de endamên HPG'ê Ahmet Ateş, Sadik Dulekan, Hamît Ersan, Ahmet Şerîf Karakaya, Sîham Hannan û Vesîle Alturk jiyana xwe ji dest dabûn. Malbatên Karakaya, Alturk û Ateş ji bo ku cenazeyan bigirin serî li dozgeriya komarê ya Dihê dan. Dozgeriyê îdia kir ku cenaze li cihê pevçûnê mane û ji ber ewlehiyê nikarin cenazeyan hildin.



Li navçeya Akyazi ya Sakaryayê piştî êrîşa li hemberî ciwanên kurd ku di encamê de kesekî jiyana xwe ji dest da û yek jî birîndar bû, xizmên malbatan û nûnerên rêxistinên civakî yên sivîl daxuyanî dan û bal kişandin ku kampanyaya lincê ya li dijî kurdan didome. Serokê DTP û Şaxa ÎHD'a Sakaryayê diyar kirin lînca li Sakaryayê organîzekirî û sîstematîk e... RÛPEL - 3

### 2 zarok û mamosteyek binçav kirin

Polîsan li navçeya Bazîdê, avêtin ser malên zarokên bi navê M.S. û E.A. yên di koma muzîkê ya Ehmedê Xanî de cih digirin û mamosteyê wan Seyît Tayfur. M.S., E.A. û Seyît Tayfur hatin binçavkirin. 3 kes piştî pirsyarkirina li midûriyeta ewlehiyê sewqî dozgeriyê kirin. Hate gotin hincet stranên bi kurdî ne.

# Ji bo dewletê 'edet' e bo gelan 'qebhet'

**HESEN HUSEYÎN DENÎZ**

**Li ber çavê cîhanê tevî hikûmeta Srî Lankayê gelê tamîlî hate qirkirin. Ka kîjan hêza dewletî li dij derket û ji bo pêşî li qirkirinê bigire mûyek laşê xwe livand? Li Filistînê ji rewş wiha ye û li Kurdistanê jî rewş jê xirabtir e**

Têkoşîna di navbera mazlûm û zaliman de, mixabin her dem hişmendî para aliyê mazlûm dikeve. Zalim her zalimiya xwe dikin û di zalimiya xwe de bi heter tevdigerin. Ev heterî jî ji hêza zordariyê tê. Hêzek çekdarî, yek aborî û yek siyasî xistine dest xwe û şûrê xwe dihejînin; êdî kî ket ber devê şûr!

Di cîhanê de sazûmaneke dewletî heye ku, hêzek dewlet be, çi dibe bila bibe, her mafê wê yê kuştin û zilmkirinê heye. Ev şaştiyeke mezin a sazûmana cîhanî ye ku bi sedsalan e dimeşe.

Li ber çavê cîhanê tevî hikûmeta Srî Lankayê gelê tamîlî qir kir. Ka kîjan hêza dewletî li dij derket û ji bo pêşî li qirkirinê bigire mûyek laşê xwe livand? Ger gerîlayên Tamîlî qirkirineke wiha li ser Srî Lankiyan meşandiba niha ji Amerîka bigir heta Netewên Yekbûyî wê qiyamet rakiribana, civîn li ser civînê li dar xistibana û ew bi terorîstiyê tawanbar kiribana. Lê ka kî ji hikûmeta Srîlankayê re dibêje `terorîst`?

Kesek nabêje. Çima? Ji ber ku ew `dewlet` e. Dema hêzek dewlet be, dikare pêlî mafê mirovan bike, dikare gelên mazlûm qir bike.

Heta kengî wê ev bêmafiya bi yekalî bidome?

Li Filistînê jî rewş wiha ye. Dema kesekî cihû tê kuştin Amerîka, Netewên Yekbûyî kirasê xwe diçirînin, dibêjin `Hamas terorîst e`. Lê ku artêşa Israîlê dikeve Xezayê û bi sedan jin û zarokan dikuje, kesek dengê xwe nake û nabêje `Hikûmeta Israîlê terorîstiyê dike`.

Li Kurdistanê jî rewş ji van xerabtir e. Dema aliyê kurd guleyekê diteqîne cîhan tev radibe ser lingan; Amerîka ji aliyekî, Ewropa ji aliyekî, Neteweyên Yekbûyî ji aliyekî hêza kurd bi teroristiyê tawanbar dikin, banga destjêberdana çekan dikin. Lê va ye ev çend meh in aliyê kurd çek dane rawestandin, tevî vê aliyê tirk her roj operasyonan li dar dixe û mirovan dikuje; kesek nabêje, `dewleta tirk terorîstiyê dike.`

Durûtiya dewletên cîhanê wê heta kengî bidome?

Dibêjin; `Li çiyê divê kesekî çekdar nemîne!` çima tu zilmê dikî, çima wê kesek li hemberî te nikaribe xwe biparêze? Ger pêwîstî bi hêzek çekdar nîn e, destpêkê tu hêza xwe ya çekdar ji holê rake. 8 sed hezar leşkerên te hene, te çav berdaye 8 hezar gerîlayên kurd. Tu dibêjî; `Ez wana tevan biqelînim, piştre pariyekî nan bidim kurdan!` Na! Saeta te nexweş be! Ew pariyê nanê te bila serê te bixwe.

Dewleta Srî Lankî jî wiha hizirî, bi dehhezaran kesên bêguneh qir kirin. Niha jî dibêjin; `Em ê destûrê bidin wana ku vegerin gundê xwe û tev li hilbijartinan bibin`.

Ev bêrûmetiya herî mezin e. Tê malên wan hilweşînî, bisojî; bi tank û topan wêran bikî, zêç û zaroyên wan tevan bikujî; piştre jî bêjî; `Êdî dikarin bikevin hilbijartinan!`

Ev tê vê wateyê: `Min pişta te şikand, baskên te qusandin; êdî tu dikarî di destê min de bibe qirdek ku ez hemû kar û xizmetê bi te bidim kirin!`

Ev siyaseta desthilatî û zordarî wekî nesaxiyeke vîrusî di xwîna sazûmanên dewletî de heye. Dibêjin, `Serî bipelixîne û bi laş bileyize!`Tişta li Srîlankayê hat kirin ev e. Xwestin vê yekê bi serê gelê kurd de jî bînin. Lê ji ber hinek sedemên dîrokî û erdnîgarî nikarîbûn bi ser biketa. Lê hîn ev virûs ji xwîna dewletê derneketiye. Bi girtina birêz Ocalan dixwestin tevgera gelê kurd bipelixînin û bi gel bilîzin. Her çiqasî bi ser gerîlan de çûn, tang, top, firoke û teknîka herî kujêr bi kar anîn; pê nikarîbûn. Çiyayên Kurdistanê rê neda ku dewlet bi ser bikeve. Xaka tamîliyan warekî teng û xweser bû. Lê Kurdistan ne wiha ye; çiyayên wê yên asê, erdnîgariya wê ya dewlemend û fireh, rê nade ku dijmin zû bi zû bi ser bikeve. Ev taybetmendiya Kurdistanê û bîr û baweriya gerîla gihişt hev û gelê kurd ji pêşerojeke wekî ya bi serê Tamîliyan de hat parast.

Niha dewlet li riyekê digere bê çawa bikaribe têkoşîna kurd lawaz bike, tengezar bike. Dixwaze lihevhatineke wiha bi serdestiya xwe çêbike. Lê ev yek jî zû bi zû bi dest nakeve. Wê demê hartir dibe û êrîşên xwe gurtir dike.

Niha aliyê kurd çek dane rawestandin; banga aştiyê dike; derfeta aştiya civakî ji her demê zêdetir sitewiyaye; her du alî jî dizanin ku tenê bi çekê hêzek nikare ya din tune bike; domkirina şer di her du aliyan de birînên nayên dermankirin vedike; dûvdirêjkirina şer di civakê de çetetî, bêexlaqî, birçîbûn, nijadperestî û neduristiyê li pêş dixe. Hîn duh li Akyaziya Sakaryayê ji aliyê nijadperestên tirk ve du kurd hatin kuştin. Ger kurd jî rabin du ciwanên tirk bikujin, wê dawiya vê bibe çi, kî li ser dihizire?

Bi vê sedemê, hişmendiya ku aliyê kurd bi yekalî bi salan e didomîne, êdî ji kerema xwe re bila aliyê tirk jî carekê nîşan bide; yan na çi biqewime sedem û berpirsyar dewlet û sazûmana tirk bi xwe ye. Divê were zanîn ku êdî kêrê hestî derbas kiriye!



# Kurdî çi ye?

**MAMOSTE MARÛF**

Kurd bi giranî ji sedsala 19'an vir de ji bo mafên xwe yên netewî têdikoşin, xwîn û xwîdana xwe tevlî hev dikin û dirijînin. Lê heta ev çend salên dawîn, wan di warê ziman de pir tişt nekir; li benda avakirina Kurdistana serbixwe sekinîn. Piştî fêm kirin dîtin ku di şert û mercên cîhanê yên îro de dewleteke serbixwe zû bi zû ne pêkan û hêsan e, dêhn û bala xwe dan ser zimanê xwe yê ji hêla wan ve heta niha paşguhkirî, sêwî hiştî.... Lê ew nizanibûn ku ziman, bi gotina wêjenas û zimannas û lêkolînvanê îngîlistanî yê bi nav û deng Samuel Jhonson (Doktor Jhonson, 1709–1784) "pîşeyek nankor e" û tu gavek jê dûr bikevî ew bi çargavî ji te direve.

Dîsa ew nizanibûn ku ziman wek candarek ji candaran e û ger tu lê xwedîtî nekî nikare li ser xwe bimîne; dimire diçe... Lê zimanê kurdî her çiqas di dirêjahiya desthilatdariya kadroyên nijadperest ên komarê de derbeke mezin xwaribe jî bingeha wî pirî zexm bû winda nebû û bi nîvruhî be jî heta roja îro hat.

Xwediyên wî yên têkoşer ên heta çend sal berê jî pişta xwe pê de kiribûn ji nişka ve li xwe varqilîn dîtin ku êdî hew dikarin bi zimanê bav û kalan biaxivin! Bi lez û bez mil û zend badan û dest bi xebatê kirin; lê hezar heyf û mixabin ew gelek ji wan êdî nikaribûn wek mezinên berê bi zimanekî xwezayî û fesîh û letîf û bi coş û bi kêf û henekan tijî biaxivin... Belê zimanê wan ji peyvên xerîb hatibû safîkirin û bi yên kurdî hatibû xemilandin û dewlemendkirin lê giyan û mejî û şêwaz çêkirî û biyanî bû... Dersa mezin a divê mirov jê bigire ev e: Te ziman winda kir, belê tu dikarî bi xebateke bêhempa dîsa bi dest bixî; lê ew bi rewş û xemla xwe ya berê nayê...

Zimanê kurdî piştî hişmendiya van çend salên dawîn hema bêje serê xwe ji xewa mirinê rakir û hat ser hemdê xwe. Lê hê jî bi xetereyek pir mezin ve rû bi rû ye. Başûr ne tê de li tevahiya parçeyan ji ber tunebûna derfetên perwerdehiya bi kurdî, ji ber qedexekirina wî ya li qada fermî, ji ber tengbûna bazara wî, ji ber biçûkdîtin û bêrûmetkirin û şerê psîkolojîk ê dagirkeran ji hêla girseya mezin a kurdên apolîtîk ve bi têra xwe nayê bikaranîn. Bi taybetî nifşên nû yên ji gundên xwe derketine û li bajar û metropolan bi cih û war bûne di nav çend salan de xwe ji ziman dikin.

Ev rewşa bêzimaniya girsehî ya kurdan çend nifş şûn ve bênasnametiyeke giran jî bi xwe re tîne. Ev "mirovên bi dirûvkî, bi bejn û balan kurd, lê giyan û mejî ne tu tişt" dikin serûbinobûyina derûnî ya xwe - ev yek bi serê xwe nexweşiyek e- bi peydakirina nasnameyeke çêkirî derman bikin. Ev derman an teqlîdkirina nasname û çand û rabûn û rûniştandina netewa mêtingeh e; an jî jiyaneke ji serî heta binî bi şert û ruknên olî honandî ye... Ev nasnameya nû ya ku ew nabêjin çê ye, xerab e dixin şûna hemî kevneşopiyên netewî û herêmî yên bav û kalan, pirî caran kesayetiyeke ew qas serhişk û bêhnteng û hov û fanatîk derdixe holê ku li tu dera cîhanê, di tu dewr û dewranan de kes lê rast nehatiye û nedîtiye...

Tevkujiya li gundê Zankirtê û mêrkujiyên bi "domûzbaxî" yên "Hîzbula" yên di salên 90'î de qewimîbûn mînakên herî berbiçav ên vê kesayetiyê ne... Ev kesayetiya "çêkirî û malê diziyê" gelek caran jî durû û teqiyekar û berjewendîperestên herî hoste yên civakan diafirîne. Piraniya "siyasetmedarên esilkurd" ên olparêz û tirkparêz ên 80 salan ên Cumhûriyetê bi vî şiklî ne...

Em bi dilrehetî dikarin vê yekê bibêjin: "Zimanê kurdî ne tenê mifteya çareseriya pirsgirêka kurd e; ew dermanê çareseriya pirsgirêka tenduristiya giyanî ya kurdan e jî."



**Kadîn**

**Serkeft Botan**

*serkeftbotan@hotmail.com*

## Kurmê şîrî heta pîrî

Gelek caran hêzên parastina gelê Kurdistanê destên xwe yên biratiyê bi şêwayek dostanî û sidqane ve dirêjî vê dewletê kiriye pêşwaziya vê niyetê bi xerabiyê hatiye dayin.

Hêzên parastina gelê Kurdistanê bedelê vê niyeta xwe ya pak û temîz bi giranî daye. Helbet aştî ne karekî hêsan e.

Aştî karê esîlzadeyan û dinyadîtiyan e. Ên ku êş û kederên şer û pevcûnan dizanin û di kûrahiya mêjî û dilê wan de ku zingîniya êş, bêrîkirin, kul û keder ku li bin guhê hev dikevin û di ukumin aştiyê dizanin.

Ew kes an ew hêl qedir û xatirê biratî û aştiyê dizanin.

Ji hilbijartinên 29'ê adarê bi vî alî ve hêzên parastina gelên Kurdistanê biryara bêçalaktiyê da û xwe spart pozisyona parastinê.

Ji wê demê vir de Artêşa Tirk dîsa xwîn bi paxila xwe ve dît û weke gurê har dîsa li erdnîgariya Kurdistanê harî hêberî bûye û terka wan feraseta xwe ya qirêj nekir û êrîş li ser êrîşê dibe ser hêzên parastina gelê Kurdistanê.

Xwe mekroh dike û xwe ji firaqê derdixe. Ev helwesta Artêşa Tirk ji kûraniya dîroka wan tê. Ji ber ku korfirsetîne û naxwazin vî tabîetê xwe yê dîrokî winda bikin.

Bername û plansaziya wan ya tunekirinê ku li ser gelê Kurdistanê helbet ne ji roja îro de ye. Ji 80 salan wêdetir e.

Wan got ku em rêber û serokên gelê Kurdistanê dîl bikin, ew ê kokê li kurdan bînin: Lê ew plansaziya wan bi ser neket. Hindik maye ku tivinga wan bi wan de biteqe. Ev serkeftin û berxwedan tu rastiyê bibêjî ya Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan e.

Berxwedana Îmraliyê gelê tirk û cîhan jî di nav de matmayî hiştî ye. Jixwe dixwestin ku berxwedana gelê Kurdistanê di şexsiyeta Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan de bitepisînin.

Lê berxwedana Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan hemû plansaziya wan serobin kir. Israrkirina Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan a aştî û çareseriya bi riya demokrasiyê bername û planên wan ên xerabiyê tev têk birin û riya tevayê xirabiyan ji dest wan girt.

Aştiya ku niha dixwazin ne ji dil û can de ye. Lê hêjayî ceribandinê ye ka em mêze bikin van çend rojên dawî heta 1'ê Hezîranê ka li binê wê çi dek û dolab bên gerandin, di nava xumamê de ye.

Sekin û helwesta gelê kurd û nûnerê wî diyar e û ku çi daxwaz dike aşkera ye.

Gelê kurd ne şerxwaz e lê heta ku bêhnê bide û bistîne wê daw û doza azadî û mafên xwe yên rewa bike.

Dizane şer jî bike û qedir û qîmeta biratî û aştiyê jî baş dizane.

Bi hêviya ku aştî û aşbûnek bê welatê me û dewleta tirk dev ji tabîetê xwe yê berê berde.

**HAWAR**

**Aram Basın Reklam ve Yayıncılık Tic. San. Ltd. Şti.**
Adına İmtiyaz Sahibi ve Sorumlu Yazı İşleri Müdürü
**Bedri ADANIR**
***Adres:*** Kooperatif Mahallesi Gevran Caddesi 1 Geçit. Sarıoğlu Apt. Kat: 4 No:14 Ofis Yenişehir - Diyarbakır
***TEL:*** 0 (412) 229 00 30
***Fax:*** 0 (412) 229 00 39

Baskı ***(ÇAP):***
***Stenbol:*** Gün Matbaacılık, Reklam, Film, Basım, Yayın, Tan. San. Tic. Ltd. Şti. Beşyol Mah. Akasya Sok. No: 23/A Sefaköy - Küçükçekmece İstanbul
***Tel:*** 0 (212) 580 63 80
***Edene:*** Arslan Güneydoğu Gazetecilik, Matbaacılık, Kağıtcılık A.Ş İstiklal mah. İstiklal. Cad. ***No:*** 44 Seyhan Edene
**Yayın Türü:** Süreli

www.arsivakurdi.org

# 'Muxatabê pirsgirêka kurd DTP ye'

**Piştî hevpeyvîna Hasan Cemal a bi Serokê Konseya Rêveber a KCK'ê Murat Karayilan re li Tirkiyeyê nîqaşên ji bo çareseriya pirsgirêkê ketin rojevê. Saziyên civakî dê ji bo çareseriyê bi partiyên siyasî re hevdîtinan çêkin û dê bêjin muxatabê pirsgirêkê DTP ye**

## Ahmet Turk ji CHP'ê re peyam şand

Hevserokê DTP'ê Ahmet Turk pêr êvarê bi Cîgirê Sekreterê Giştî yê CHP'ê Mesut Deger re hevdîtinek pêk anî. Turk û Deger bi hev re şîvek xwar. Di vê hevdîtinê de Turk bi navgîniya Deger peyama hesas tevgera CHP'ê ya ji bo pirsgirêka kurd şand.

Piştî hevdîtinê Turk ji rojnamegeran re anî ziman ku hevdîtina wan a bi parlamenterê CHP'ê yê berê re xwedî wateyeke siyasî nîn e û wiha got: "Hevalê min ê 30 salan e û parêzerê min e. Hewce nake ku wateyeke siyasî lê bê barkirin. Dema ez li girtîgehê bûm, parêzerê min bû. Bavê wî jî dostê min bû. Hevalekî min ê parlamenter e. Car car wisa tên cem hev."

**Bo rojnameya me axivî**

Mesut Deger jî anî ziman ku hevdîtin li ser daxwaza Turk pêk hatiye. Deger diyar kir ku di hevdîtinê de pirsgirêkên herêmê hatine rojevê û li ser pirsgirêkan danûstandineke fikrî di navbera wan de pêk hatiye. Deger piştî hevdîtinê nêrînên xwe bi rojnameya me re parvekirin û wiha got: "Di hevdîtinê de ji aboriya herêmê heta pirsgirêkên betaliyê gelek mijar hatin rojevê. Her wiha rewşa dawî jî hate rojevê û me nêrînên xwe parvekirin."

**'Baykal nêrîn vegotin'**

Li ser pirsa helwesta CHP'ê ya ji bo pirsgirêka kurd dê çibe?, Deger ev bersiv da: "Serokê Partiyê Baykal nêrîna me aniye ziman. Serokê partiya me gotiye, 'ji bo ku hin tişt bêne axaftin divê pirsgirêka 'terorê' ji holê rabe. Em naxwazin 'teror' siyasî bibe.' Her wiha pirsgirêka destênedana parlamenteran jî yek ji mijarên esasî yên rojeva me ne. Ji bo herêmê serokê partiya me aniye ziman ku 'nasname şerefa mirov e'. Her wiha navên çandî jî divê bêne dayîn."

Deger, pirsa me ya li ser mebesta ji bo 'dawîlêanîna ji bo 'terorê' dê bê fêmkirin? Ji vê yekê tasfiyekirina PKK'ê dixwazin? bersivand û wiha got: "Niha derve 5 hezar milîtanên rêxistinê hene. Bêguman qala kuştina wan nayê kirin. Ji 'dawîlêanîna terorê' mebesta me ew e ku êdî kuştin çênebin. Dema îro dîsa cenaze bên, bingehê axaftina vê pêvajoyê zor e. Em dibêjin bila ewilê dawî li şîdetê bêanîn."

Deger ligel li ser naveroka hevdîtina bi Turk re tiştek negot, diyar kir ku ji ber ku nexşeriyeke ji bo çareseriyê li holê nîn e, mecalê nirxandineke berfireh a li ser pêvajoyê jî tuneye. **ENQERE**

Nîqaşên li ser pirsgirêka kurd berdewam dikin. Serokê Giştî yê KESK'ê Samî Evren diyar kir ku lazim e nîqaşên erênî yên der barê pirsgirêka kurd de bêne xurtkirin. Serokê Konseya Navendî ya TTB'ê Gençay Gursoy jî derbirî ku pirsa "Muxatap kî ye?" zêde tê kirin û wekî muxatap DTP nîşan da.


Piştî nîqaşên der barê pirsgirêka kurd de gelek saziyên civakî yên wekî KESK, DÎSK û TTB ji bo hevdîtina têkildarî mijarê randevû ji Serokomar, Serokwezîr û partiyên siyasî xwest. Li ser mijarê Serokê Giştî yê KESK'ê Samî Evren diyar kir ku bi reçeteyeke amadekirî naçin Enqereyê û ji bo çareseriyê pêwîstî bi demokratîkbûna Tirkiyeyê heye. Evren, bal kişand hevpeyvîna Hasan Cemal a bi Serokê Konseya Rêveber a KCK'ê Murat Karayilan re û wiha got: "Karayilan pir bi zelalî îfade dike. Dibêje nîqaşa sazûmankariya ûnîter tune ye. Ev yek gavek girîng e. Tirkiye lazim e bi livdanên navxweyî vê pirsgirêkê çareser bike. Peyamên Serokomar ên erênî jî ev rastiye daniye holê. Lazim e ev hewayê erênî bê xurtkirin. Hewceyiya Tirkiyeyê bi vê yekê heye." Evren, da zanîn ku daxwazên kurdan daxwazê mirovîn in û axaftina xwe wiha dirêj kir: "Daxwaz li holê ne. Em bawer in ev daxwazên maqûl in. Perwerdehiya zikmakî, nasname, çand mafên mirovîn in. Ji bo çaresernekirinê tu sedem tun in. DTP'ê li herêmê ji sedî 50'î zêdetir deng girtine û îradeya gel temsîl dike. Zordariyên li hemberî DTP'ê di vê demê de gelek bêwate ye. Gazîkirina DTP'yiyan a îfadeyê zirarê dide pêvajoyê. Pêşniyarên Serokomar, partiya îktîdarê û CHP'ê dibe bên nirxandin. Di nav civakê de hewayek erênî heye. Lazim e ev baş bê nirxandin."

**'Nêzîkatiyên cuda hene'**

Serokê Konseya Navendî ya TTB'ê Gençay Gursoy jî daxuyand ku piştî pêvajo û êşên hatine jiyîn, nîqaşên dawî wekî fersenda dawî dixuye. Gursoy wiha pêde çû: "Di paşerojê de jî hewayên wiha çêbûn. Lê di nav dewletê de hînbûnek pûç derxistina van pêvajoyan heye. Serokomar Gul berî niha jî daxuyaniyên wiha didan lê niha aşkeratir tîne ziman. Lê li aliyek din em lê dinêrin dozger der barê Serokomar de biryara dadgehê derdixin. Ev yek nîşan dide ku li Tirkiyeye hêzên cuda ên li ser kar hene. Nêzîkatiyên cuda hene. Li gorî daxuyaniyan wisa tê dîtin ku hêzên çekdar jî di vî warî de erênî ne. Lazim e Tirkiye teqez vê derfeta nîqaşê baş bi kar bîne. Berî her tiştî hewceyî bi zemîna diyalogê heye." Gursoy diyar kir ku têkildarî muhatap pirs tên kirin lê di vê pêvajoyê de muhatabê pirsgirêka kurd DTP ye.

Têkildarî daxwazên dê li Enqereyê bînin ziman jî Gursoy derbirî ku berî her tiştî hewceyî bi hawirek bêpevçûn heye û wiha pêde çû: "Em dê têkildarî afirandina derfetên aştiyê nêrînên xwe ji aktorên siyasî re ragihînin. Em dê bixwazin ji bo nîqaşkirina pirsgirêkê hawirek baş bê afirandin." **STENBOL / DÎHA**


Samî Evren



Gençay Gursoy

## MLKP'î ji bo DTP'ê ketin grevê

Girtiyên MLKP'ê yên li 1'emîn Hejmara Girtîgeha Tîpa F a Kocaeliyê dimînin ji bo piştgiriya DTP'ê ketin greva birçîbûnê ya 2 rojan.

Li ser navê girtiyan Cihan Denîz Tarak faksek ji saziyên çapemeniyê re şand û daxuyand ku girtiyên MLKP'ê yên li 1'emîn Hejmara Girtîgeha Tîpa F a Kocaeliyê dimînin ji bo piştgiriya DTP'ê ketin greva birçîbûnê ya 2 rojan. Di faksê de hate daxuyandin ku bi armanca balkişandina ser zordariyan û hevgiriya bi DTP'ê re dest bi vê çalakiyê kirine. Di faksê de wiha hate gotin: "Êrîşên li hemberî DTP'ê li dijî vîna gel a rewa û demokratîk pêk hatiye. Bi êrîşan hatiye xwestin mafê siyasê yê gel bê asteng kirin. Ji ber vê yekê em girtiyên ji doza MLKP'ê girtî bi armanca piştgiriyê di 24-25'ê gulanê de dikevin greva birçîbûnê." **STENBOL**

**Bulent Arinç der barê guftûgoyên çareseriya pirsgirêka kurd de daxuyaniyên bi nakok dan**

## Hewldanên xapandinê

Rayedarên dewleta tirk ji aliyekî ve peyamên pêwîstiya 'çareseriyê' didin, ji aliyê din ve mikur tên ku tu amadekariyên hikûmetê tune ne. Wezîrê Tirk Bulent Arinç diyar kir ku, ji bo çareseriya pirsgirêka kurd, tu amadekariya hikûmetê nîn e, lê dibe ku hin danûstandinên Serokwezîr Recep Tayyîp Erdogan hebin. Cigirê Serokwezîrê û Wezîrê Dewletê yê Tirk Bulent Arinç tevli bernameyeke televîzyoneke tirk bû û bersiv da pirsên der barê pirsgirêka kurd de. Bulent Arinç gotinên Serokomarê Tirk Abdullah Gul ên der barê pirsgirêka kurd de wekî gotinên erênî nirxandin û pêwîstiya mafên çandî yên kurd bên nasîn, anî ziman.

Têkildarî mijarê Arinç ev tişt gotin: "Axaftina rêzdar serokomar a hêvî dan bi erênî pêşwazî dikim. Bilêvkirina çareseriya pirsgirêkê heyî, anîna ziman a şert û mercên heyî yên çareseriyê û daxwazkirina ku derfeta heyî ji dest neyê revandin gelekî xwezayî bû. Lê ev 15 roj in ez endamê hikûmetê me. Di civîna Desteya Wezîran de tu axaftinên têkildarî vê mijarê heta niha ne hatine kirin. Lê bêguman dibe ku hin danûstandinên serokwezîrê me hebin."

Arinç jî pirsgirêka kurd bi paşdemayina herêmê re xwest rawe bike û ragihand ku ew alîgire ku têkildarî nasnameya kurd mafên çandî bên naskirin. Lê tevî vê yekê jî bi israr hewl da mijarê wekî 'pirsgirêka terorê' bi nav bike û peyamên ew ê siyaseta kevneşop a dewletê de israr bikin da.

Arinç anî ziman ku heta Tirkiye pirsgirêka kurd çareser neke, dê nikaribe bigihêje aramiyê, ligel van gotinan jî got ku; wekî hikûmet tu amadekariyên wan ên ji bo çareseriya pirsgirêka kurd nîn in. Lê belê dibe ku hin hewldanên Serokwezîr Tayyîp Erdogan hebin.

**Êrîşî DTP'ê kir**

Wezîrê Dewletê û Cîgirê Serokwezîrê Tirk bibîrxist ku rêveberên siyasî jî û leşkerî jî dibêjin ku heta niha di pirsgirêka kurd de gelek şaşî kirine û got: "Divê em ji şaşiyên wê demê dersan derxin û heman şaşiyan nakin".

Bulent Arinç siyaseta yek milet, yek ziman û yek nasnametî ya partiya xwe ji nedîtî ve hat û DTP bi meşandina siyaseta nasnametî sûcdar kir. Arinç li ser pirsekê jî got ku dê serokwezîr di demeke guncav de, bi Hevserokê DTP'ê Turk re hevdîtinek pêk bîne. Wezîrê Tirk Bulent Arinç bi sedema gotinên xizmetê çareseriyê nakin, tînin ziman, CHP û MHP jî rexne kirin. **ENQERE**



## Mesûd Barzanî ji bo Serokatiya Herêmê serlêdana xwe pêk anî

Serokê Herêma Federal a Kurdistanê Mesûd Barzanî, serî li Lijneya Bilind a Hilbijartinê da û namzetiya xwe ya ji bo dema bê jî aşkera kir.

Barzanî pêncşema borî li Hewlêrê çû Lijneya Hilbijartinê ya Bilind û ji bo dema pêş serlêdana xwe ya ji bo Serokatiya Herêmê îlan kir. Serokê Lijneya Hilbijartinê ya Bilind Elî Qadir, di çûna Barzanî de ew pêşwazî kir.



Ligel hilbijartinên 25'ê tîrmeha 2009'ê ya parlamantoyê Serokê Herêma Kurdistanê jî dê rasterast bi dengên gel bê hilbijartin. Ji bilî Mesûd Barzanî heta niha tu kesê din ji bo Serokatiya Herêma Kurdistanê serlêdan pêk neaniye.

Mesûd Barzanî di 12'ê hezîran 2005'an de ji aliyê Parlamentoya Herêma Kurdistanê ve bi yekdengî wekî Serokê Herêmê hatibû hilbijartin. Makeqanûna Herêma Federal a Kurdistanê dema Serokatiya Herêmê ji bo 4 salan destnîşan kiriye. Barzanî piştî 4 salên wî temam dibin dikare ji nû ve bibe namzet. Her çiqas cara yekemîn Serokê Herêmê ji aliyê parlamentoyê ve hatibe hilbijartin jî care duyemîn dê ji aliyê gel ve bê hilbijartin. **HEWLÊR**

## Enqere bû tozgevizka dij-kurdan

Ligel nêzîkbûna hilbijartinên Iraqê tifaqa dij-kurd a Iraqê Enqere ji xwe re kire tozgevizk. Balkêş e ku di demên dawî de hatina dij-kurdan a ji bo Enqereyê zêde bûye.

Muqteda el Sadrê ku wekî dijberê Amerîkayê tê zanîn ligel biryardayîna ji bo avakirina partiya siyasî Enqere ziyaret kir. Usame Necefiyê ku ji Lîsteya Neteweyî ya Iraqê hatiye hilbijartin û di mijara Kerkûk û Misûlê de bi helwesta xwe ya nîjadperest tê nasîn jî riya xwe di Enqereyê xistit. Yek ji dij-kurdên din Salih el Mutlaq jî ku nêzî hişmendiya Baasê ye pêr li Enqereyê bû.

Serkêşê Eniya Diyalogê ya Iraqê Salih el Mutlaq bi Nûnêrê Taybet ê Wezareta Karên Derve ya Tirkiyeyê yê Iraqê Murat Ozçelîk re hevdîtinek pêk anî.

Salih el Mutlaq piştî hevdîtina bi Ozçelîk re bi qasî saetekê bi Serokwezîrê Dewleta Tirk Recep Tayyîp Erdogan re jî rûnişt.

Salih el Mutlaqê ku di hilbijartinên Serokomariya Iraqê de bibandor e, beriya niha ji bo ku tevli hilbijartinên Iraqê bibe ji aliyê Tirkiyeyê ve hatibû îknakirin. Tevgera Nîjadperest a Iraqê ku Salih el Mutlaq serkêşiya wê dike di hilbijartina senotoyê de 35 deng girtibûn. Senato di hilbijartina serokomar de xwedî risteyeke girîng e.

Yek ji dij-kurdên ku di demên dawî de riya xwe di Enqereyê xistî Serkêşê Partiya Biryareya Tirkmenan Faruk Abdullah Abdurrahman e.

Her wiha di nava rojên dawî de Eniya Tirkmenên Iraqê (ITC) guhertineke girîng pêk anî. Nûnerê ITC'ê yê Tirkiyeyê Ahmet Muratli ji peywîrê hate girtin, li cihê wî Sadun Koprulu hate wekî wekîl hate peywîrdarkirin. **ENQERE**

www.arsivakurdi.org



Şador
Dilawer Zeraq
dzeraq@hotmail.com

## Zanîn, bibîrxistin û mirovbûn

Car caran ku em di axaftin û sohbetan de bi xwe diqehirîn û me berê xwe dida xwe, berî ku em bi canê xwe kevin, şair wiha digot, *"Heyra em xwe nexapînin, kurd bîrkor in."**

***

Her cara ku ji derveyî min de derbek li min tê xistin, êş û janên ku di hundirê min de hêlîna xwe çêkirine, bûne wek parçeyekî min, bi min re ketine nav keftûlefta jiyanê, dest pê dikin; serê ewil xwe bi mêjiyê min didin hisandin, dûre berê xwe didin dilê min…

Vê carê jî wisa bû…

Gava serê Seyfî bi hêrseke sed salane û bi 'qûndaxa mêraniyê' dihat pelixandin, -bi min wisa tê ku ji ber ecêbî û sosretiya kana ku ev hêrs jê dize, çi sosyolojî çi jî psîkolojî têr nake ku sedem û bingeha vê kirinê bi temamî were dîtin, were veçirandin û aşkerakirin-, bi derba ewil re ku hat lêdan, mêjiyê min êşiya, dûre dilê min bû hevalbendê dilê wî yî pepûk û ji bêdengiya wî, qîjîn û hawarxwestina wî ya 'dilkuj û mirovsoj' gihîşt guhên min û…

Min Evdilayê dozdeh salî û Ertûşoyê çardeh salî car din bi bîr xist…

Û Evdilsemed jî da dû wan…

Vê carê bîrkoriya me hê bêhtir zor da min û gotina Sokrates ku dibêje, "hînbûn bibîrxistin e." di ber guhên min de kir çingînî.

Pê re jî min dest bi axaftina bi xwe re kir û got, "Ger wisa be, mirov bi her cara ku bi bîr dixin re hîn dibin, bi hînbûna xwe re jî sînorê mêjiyê xwe firehtir û zanîna xwe jî kêrhatîtir dikin."

Piştî dayîna navberekê, min axaftina xwe ya bi xwe re domand, "Heke wisa ne, gelo çima di her carê de derba ku ji derve de li me tê dan, hişktir û tundtir dibe? Ma em qet tiştan bi bîr naynin?"

Sokrates, dev ji min neqeriya, car din xwe xist bîra min, dengê xwe gihand min û gotina xwe wiha temam û sergihayî kir; "bibîrxistin di heman demê de çalakiyeke îdeolojîk e jî."

Vê carê kevir wek qalibekî di heriyê de cih girtibû.

Hînbûyîn di esas û xwezaya xwe de, bi îdea, yanî bi fikr û ramanê re têkildar bû û bêyî wê nedibû. Û her bibîrxistin, car din û jinûvehînbûna dîrokê bû. Û her hînbûn dibû sedem ku fikreke me ji bo roja îroyîn çêbibe, em ji bo siberojê deriyê hînbûnên dîtir vekin û zanînên xwe watedartir bikin.

Belê, ger mirov li dîrokê binihêriya û her tişt ji awirê dîrokê ve fêm bikira û binirxanda, şair ne neheq bû.

Lê êdî ba rabûbû û baranê jî her tişt şûştibû; û dem, di nav demeke wisa de diherikî ku ne pêkan û mimkun bû ku kurd di dîrokê de bialiqin.

Çalakdariya kurdan, kirinên wan ên hayjêheyî û bi hişmendî, destûr dida û dikir ku hînbûyîn nebe hînbûyîneke dîrokî, lê belê bibe hînbûyîna fikr û ramanî û karibe analîz û dahûrandinên baş bike.

Êdî me jî ji bo avakirina siberojê 'bi bîr dixist' û di her carê de jî ev bibîrxistina me li me dibû hînbûneke xurt û ciyêxwegirtî.

Êdî em jî hîn bûbûn.

Loma jî êdî derb li serê me, li kana fikr û ramanê, li sedema lipiyanmayînê, li mêjiyê dihat xistin.

Lê ez çi bêjim, tevî ku me car din her tişt bi bîr dixist û me hînbûna xwe dispart avabûna siberojeke ronîdar jî, em mirov bûn.

Bi her derbê re ku li serê Seyfî diket, êş û jana dilê me zêdetir dikir û me xwe diavêt bextê mirovbûna xwe.

* Şair, Arjen Arî.

*Têbiniyek, ji bo balkêşiya xwendevanên kurdî: Ne di eleqe û baldariya 'Wêjeya Kurdî' de ye ku tirkînivîsekî kurd bi tirkî pirtûkan nexwîne. Û hewcetiya Wêjeya Kurdî pê tune ye ku ew ji îro pê ve dest bi nivîsandina kurdî bike. Û pê re jî divê ez bînim bîra we; kurdînûsên kurd, bi gelek zimanan dixwînin, lê bi kurdî dinivîsin.*




## Lê nizanim çima

QADIR EGÎD

Gelek caran diya min û xelkên ku wî nas dikin ji min re digotin:

- Ew weliyekî Xwedê ye… Keramatên wî hene… Ew ne xalî ye!

Bayê van gotinan gelekî hestên min nedihejandin… Ne jî rola xwe li nerînên min dikir, nerînên ku min ji destpêka bîrbirina xwe de li ser girê dane:

"Di warê mêraniyê de mirovekî dil kevir e, û eger dibe dema nimêjê tu kes weke wî dil zîz nîne…"

Îroj, em ji mala wan dihatin, berê min ber bi sûkê de bû û yê wî jî ber bi mala wî ya didwan de bû; berê wî li mizgeftê bû.

Di rê de, mijarên olî hatin vekirin. Û ji ber ez di vî warî de dilê wî hênik dikim, kêfa wî gelekî ji min re tê. Min jê re çîroka pêxemberê gel û bêrîkirina wî ji me re; em kesên ku wî me nedîtiye vekir.

(Dema ku pêxember dibêje min bêriya hezkiriyên xwe kiriye, hevalên wî jê dipirsin:

- Ma em ne hezkiriyên te ne?

Li wan vedigerîne:

- Na. Hûn hevalên min in, hezkiriyên min ew in yên ku min nedîtine û bawerî bi min anîne.)

Dema ku min peyva xwe bi dawî kir, kela girî ew zeft kir, sînga wî hat hildan û daket, lêvên wî zîzikîn, mîna pelê çilo lerizîn, keserek ji biniya salên temenê berbidawî de diçe kişand û got:

- Min jî bêriyê kiriye law… Min gelekî bêriyê kiriye... Ev pênc sal in ew nehatiye serdana min, nizanim çima!!?

Berdewam kir:

- Cara dawî ku min ew dît, piştî vegera min ji ser gora wî bû. Min ew dît, min destên wî yên pîroz digirtin, maç dikirin, di rûyê xwe de didan, min di ser serê xwe re dibirin… Lê diyar e ku ez pîs bû me law, ji bilî wilo tune ye...!

Yan çima nema nêzîkî min dibe?

Ta ku hindekî êşa dilê wî sivik bikim, agirê ku di nava wî de gur bûye hênik bikim, min jê pirs kir:

- Te ew cara dawî çawa dît? Bi çi şêweyî? Mîna ku pirtûk pesnên wî didin yan bi şêweyekî din?

- Bi şêweyê ku tê pesindan kurê min, wek ku pirtûk dibêjin.

Lê aaax ax, ez nizanim çima ez nema wî dibînim… Ez bi xwe zanim sedem ji min e, ez pîs bû me, ji ber wilo nema tê.

Cara yekem hat, roniya wî ez dorpêç dikirim, min xwe diavêt destê wî, piştî maçkirinê, min destê wî di laşê xwe de dida, nizanim destê wî çawa li laşê min gişî digeriya, dibe ku destê xwe ji cihê wî derxistibe, ta ku di laşê min gişî de bê dan.

Bavê min bi peyika deriyê mizgeftê ve hilkişiya û got:

- Erê kurê min… Erê..! Min bêriyê kiriye… Lê nizanim çima wî nabînim..!?


## Ga jî hînî karê xwe dibin!

Qewlikbêjê Taxê

Rojekê mirovek gayê xwe yê pîr diajo û dibe bazarê da ku bifroşe. Kîjan canbaz berê xwe bide gayê li ber firotanê pêşiyê devê wî vedike û li rewşa diranên wî dinêre.
Di wê roja pêşîn de pir kes bi ser xwediyê gayî de tên, lê kesek vî gayê pîr nakire.
Hêrsa xwediyê gê tê û sibetira rojê jî vî gayî derdixe bazarê, lê cardin li diranên gê dinêrin û gê nastînin. Êdî xwediyê gê pir aciz dibe û dixwaze bi çi awayî bibe bila bibe ji vî gayê pîr xilas bibe. Di vê navberê de gayê me jî hînî tiştekî bûye:
Dema ku canbaz bi ser xwediyê wî de tên, bazara xwe dikin û dor tê nihêrîna diranan gayê me jixweber dev û diranên xwe nîşanî canbazan dide.
Di dawiya dawiyê de êdî gayê me hê ku canbaz berê xwe nadin xwediyê wî di pêş de devê xwe vedike û canbaz qe bi xwediyê wî re nakevin bazarê jî. Xwedî ji xwe re dibêje:
-Ga jî hînî karê xwe dibin û ez hê hîn nebûme.
Li ser vê yekê kapê gayê xwe de digire û dibe ber derê qesabekî nas. Piştî bazar û lihevkirinê ga dinihêre ku xwediyê wî çû û qesab jî rahişte kêra xwe. Carekê orînî dike, lê belê xwediyê wî lê nazivire û di ber xwe de wiha dibêje:
-Êdî tu malê qesêb î, tu diranê xwe lê nîşan didî tu çiyê xwe xwe nîşan didî tu dizanî. Mala xwediyê te xira bibe, ma tu karê xwe hîn dibî û ez nikarim hîn bibim?

HAWARA EYŞO

KURDIYA AKEDEMÎK




REMO Û ROMANTÎZM






yildizgultekin@hotmail.com
Yildiz GULTEKÎN

## Diza Gulan

Waye dîsa Usivê Kor derketiye meydanê, qet şerm û heysiyet jêra tuneye,ez teze vêya bawer dikim ku, li darê dinyayê da, dîsa ew bi tenê bimîne jî, wê heta dawiya emrê xwe bêje Porteqal û dîsa Porteqal, min got hey kevirekî weke Porteqalê bi ser lingê te da bikeve...Carana ez ji Porteqalê dipirsim:Keçê dilê te li evî mêrê kotî da heye an na? ew jî carna sor-moro dibe, hinekî jî şerm dike, dibê na, hema tu vî Usivê Kor layiqî min dibînî?Ez jî carna dikevim şikê, belkî jî Usiv eşqa Porteqalê dilê xwe da mezin kiriye,nizanim...


Her dema biharê ez kulîlkên rengîn li der û dora malê diçînim, dema ew vedibin bêhneke misk û emberê belav dikin, dema dibe berêvarî meriv naxwaze ew bêhna wan li ber bêvila mirovan belav bibe.

Îsal jî min gul zêdetir çandine, ew wisa reng rengî ku tu dibê qey ew hemî kulîlkên cîhanê topî der û dora xwe kirine... Duh na pêr serê sibê ez hema ji nava ciyan rabûm, min misîn tejî av kir ez çûm nav baxcê gulan, min ji wan re kilam gotin,min ew avdan,min der û dora wan temîz kir, heta êvarê bêhna wan zêdetir derketin.Duh ez careke din serê sibê rabûm çûm cem kulîlkên xwe, min dî tiştek hatiye guherandin lê min serî da fêm nekir ka ev guhertin çiye! Çend caran ez der û dora wan vegeriyam, min dît ku kulîlkê min piranê wan tune ye, ez hêrs bûm, agir li serê min ket, gelo kîjan xêrnexaza gulê min çilmisandine? Min dî waye jêrda Porteqal tê û qeftek gul di destan deye, hate ba min go Gulîzer van kulîlkana weke kulîlkên tene, li van der û doran kulîlkên ewqas xweşik tunene.

Min jê pirsî te ew li ku derê dîtin? Go welle îro cend roj in Usivê Kor li der û dora mala me diçe û tê, serê sibê min ew li ber deriyê me dît.Ahaa, ez niha zanim ku ev karê Usivê Kor e, min got Porteqal tu cewabeke xêrê ji Usiv ra bişîne, bila ew bê ba te, paşê ezê jê pirs kim.Êvara tarî bû Porteqalê li derî xist, min derî vekir, waye Porteqalê bi guhê Usivê kor girtiye û li ber derî sekiniye, hema min şekala lingê xwe derxist û di serê Usiv da lêxist, min got qet eyba rûyê te tuneye, tu çawa van gulan jêdikî? Tu nikarî herî der û dora wan newalan hinek gulan bidî hev ji Porteqalê ra bibe! Qet dengê xwe dernexist,hema wisa polî poşman maye û li rûyê min dinêre. Min got Porteqal evî keftarê kor zûka ji ber çavê min wenda bike, yanê ezê dereke wî jêkim. Niha ew her roj serê sibê radibe, kar û barê me cînara gistî dike, heta êvarê ew ji bo me dixebite...Ez jî nizanim wê heta kengê wiha berdewam bike....

www.arsivakurdi.org










# Bernameya fîlman a mîhrîcanê dewlemend e

Hezkiriyên sînemayê dê bi fîlmên ku di çarçoveya Mîhrîcana Çand û Hunerê ya Amedê bên nîşandan de bi têra dilê xwe li fîlman temaşe bikin. Di mîhrîcanê de ji bo sînemahezan 21 fîlmên bijarte dê bên nîşandan

Di çarçoveya 9'emîn Mîhrîcana Çand û Hunerê ya Amedê de di nava hefteyekê de 21 fîlm dê bên nîşandan. Her wiha promiyera fîlmê 'Du Ziman Baholek, Girtîgeha Hejmara 5 û Min Dît' pêk bê.

Di mîhrîcana Amedê de ji bo sînemahezan gelek fîlm hene. Fîlmên ku ji aliyê Atoleya Sînemayê ya Amedê ve hatine bijartin mînakên fîlmên serbixwe hatine bijartin. Di navbera 22'ê gulanê û 4'ê hezîranê de 21 fîlmên bijarte dê bên nîşandan. Fîlm dê di salonên sînemayê yên wekî Galeriyayê Sînemaya Ewropayê, salona şanoyê ya şaredariyê, Mega Center Cinemallê bên nîşandan.

Di mîhrîcanê de fîlmên tên nîşandan ev in; Pol (Sinif), Payîz (Sonbahar), Zarokên Taxeke Din (Başka Semtin Çocuklari), Birçîbûn (Hungry), Mommo, Çûyîn, Mîlyoner, Şîr (Sut), Qutiya Pandorayê (Pandoranin Kutusu), Jiyan Heye (Hayat Var), Ji Asîmanan Sê Sêv Ketin (Gokten Uç Elma Duştu), Şîr (Milk), Xal (Nokta), Heşt Rojên Alî (Alînîn Sekîz Gunu), Mirovê Têlê (Teldeki Adam), Rumba, Min Dît, Du Ziman Baholek (İki Dil Bir Bavul), Girtîgeha Hejmara 5 (5 No'lu Cezaevi), Close Up Kurdistan û Nêrgiz Bişkivin.

Her wiha di çarçoveya fîlmên ku di mîhrîcanê de bên nîşandan promiyera 3 fîlmên ku Atolyeya Sînemayê ya Amedê piştgirî dayê pêk bê. Fîlmê Orhan Eskîkoy ê bi navê Du Ziman Bavolek, fîlmê Miraz Bezar ê bi navê 'Min Dît' û fîlmê Çayan Demîrel yê bi navê Girtîgeha Hejmara 5 dê yekem car di mîhrîcana Amedê de derkevin pêşberî temaşevanan.

**Bernameya îro wiha ye;**

Di saet 14:30'an de li salona Sînemaya Ewropayê fîlmê derhêner Steve McQuen yê bi navê 'Birçîbûn' (Hunger) tê nîşandan. Di fîlm de têkoşîna mîlîtanên IRA'yê Boby Sands û hevalên wî yên girtîgehê tê vegotin. Fîlm nêzîkahiya dermirovahî, îşkence, psîkolojiya şer radixe ber çavan. Fîlmî gelek xelat wergirtîbûn.

Di saet 17:00'an de li salona Sînemaya Ewropayê fîlmê derhêner Atalay Taşdiken ê bi navê Mommo tê nîşandan. Di fîlm de çîroka 2 zarokên ku jinbava wan naxwaze wan xwedî bike tê vegotin.

Di saet 12:00'an de di salona Sînemaya Ewropayê fîlmê Huseyîn Karabey yê bi navê Çûyîn dê bê nîşandan. Mijara fîlmî evîna tirkekê û kurdekî başûrê Kurdistanê ye. Keça tirk Ayça ji bo bigihêje evîna xwe ber bi Başûr dikeve ser rê.

Di saet 19:30'an de li salona Sînemaya Ewropayê fîlmê Danny Boyle, Loveleen Tandan yê bi navê Mîlyoner tê nîşandan. Di fîlm de jiyana xizanên Hindistanê cih digire. Kesê bi navê Jamal Malîk beşdarî pêşbirka zanistiyê dibe û macerayên Jamal Malîk têne vegotin. Vî fîlmî îsal 8 xelatên Oscarê wergirtin. **AMED**

# 'Tewlo' TRT Şeş tewlooooo...

Di TRT 6'ê de bi navê 'Tewlo' bernameyek tê weşandin. Tewlo di kurdî de tê wateya ku mirov qerfên xwe bi yekî bike û keyfa wî pê neyê. Kurd dema ku kesekî cidî negirin dibêjin Tewlo. Gelek caran jî tîpa 'o' ya dawiya peyvê tê dirêjkirin, Tewloooo.

Di salên 1990'î de karîkaturîstên kurd bi navê 'Tewlo' kovareke mîzahê derxist. Kovar rastî eleqeyeke germ hatibû. Lê kovarê zêde dom nekir. Wan karîkaturîstan 'Tewlo' da destpêkirin û wana mîzaha kurdî bi xêz kir. Piştî ku kovarê dawî da weşana xwe navê 'Tewlo' jî ji nav weşanê derket.

Di TRT 6'ê de her rojên înê bi navê 'Tewlo' rêzefîlmek tê weşandin. Ji bo vê bernameyê hat gotin ku yekem sitcoma kurdî ye. Di rêzefîlmê de 20 lîstikvan cih digirin. Derhêneriya rêzefîlmê Ferzende Kaya dike. Her wiha senaryo jî ji aliyê Kaya ve hatiye nivîsandin û rêzêfîlm wekî; 'komediya ku jiyana nûjen a kurdan vedibêje' hat binavkirin.

Kesekî ku pir hindik kurdî bizanibe di kanala TRT 6'ê de rastî vê bernameyê bê bawer dikim dê van pirsan bike: "Ev çi ye, evqas lîstikvanên nebaş çawa anîne cem hev, mijara vê rêzefîlmê çi ye, hêmaya fîlmê çiye û çi mesajê dide. Kurdiya lîstikvanan çima evqas xirab e. Tiştên ku li piştê tên xuyakirin gelo bi niyeta dekor hatine bikaranîn. Gelo ev rêzefîlm li ser dika şanoyê ya dibistaneke seretayî tê kişandin?"

Senaryo qaşo jiyana kurdên ku li bajaran dijîn û nebûne bajarî vedibêje. Mirov difikire gelo ekîbeke ku li ser navê mîzahê evqas tiranê xwe bi kurdan bike heye. Bi destê kurdan kurd biçûk tên dîtin û ev yek jî wekî mîzahê tê pêşkêşkirin. Ger li vir niyeta xirab nîn be gelo hewceye ji bo pere qezenckirinê mirov xirabiyeke wiha wekî çanda kurdan pêşkêş bike. Lê gelo mirov ji ber ku bernameyek wiha xirab diweşîne ji TRT'ê re çi bibêje. Gelo ew dibêjin 'çanda kurdî' ev e ji bo wê diweşînin. Peyama 'Tewlo'yê ev e.

Di nivîseke der barê rêzefîlmê de hatibû gotin ku lîstikvan bi şanogerên profesyonel pêk tê. Lê dema mirov deqeyek du deqeyan fîlmê temaşe dike tu bawerî ji vê 'profesyoneliyê' nayê. Komediya ku qaşo di vî fîlmî de cih digire mirovan nade kenandin. Kesekî ku bixwaze bi zimanê xwe bernameyeke mîzahê temaşe bike bi hêrs dikeve.

Di rêzefîlmê de hin 'karakter' hatine afirandin. Karakterên kurdê ku mîdye difroşe, savara bi nok difiroşe, kurdekî ku dilê wî ketiye keçeke dewlemend, kurdê ku ji semayê hatiye. Bi qasî ku mirov fêm dike di serê senarîst de karakterên kurd bi van ve sînor kirine. Kurd bi salan di televîzyonan de wiha nehatin nasîn? Kurdên cahil ku dihatin bajarên mezin an mîdye difirotin an jî dilê wan dikete keçên dewlemend û mirovên pir qebe bûn! Mixabin 'Tewlo' van darazan piştrast dike. Di ekranê de karakterên ku simbêlboq, mirovên qebe saba, cahil… Kurdên ku bi tu awayî 'modern' nebûne… Lê gelo mirov ji bo diyalogên teqlîdên fîlmên tirk çi bibêje ? Kîjan kurdê ku dema diaxive bi zaravayê tirkekî ku kurdî nizane diaxive? Dîsa kostum û makyajên lîstikvanan… Tu yek rast nîn e. Ji bo ku dîmena pisîkê bidin mirovî ser çavê wî boyax kirin û dêça pisikê ji xwe ve kirin di bernameyên salên 1980'î de ji bo zarokan hatin kişandin de ma. Gelo ekîba 'Tewlo' sala 2009'an najî. Bi kurtasî li hemberî gotina 'bi butçeyeke hindik ve tê kişandin' ev rêzefîlm namzetê bernameya herî xirab a dîroka televîzyonan e. **AMED / ANF**

# Hostayê Bilûrê jiyana xwe ji dest da

Li rojhilatê Kurdistanê hostayê bilûrê yê 84 salî Qadir Adullazade ku wekî Qale Mere dihat nasîn jiyana xwe ji dest da.

Qadir Adullazade di sala 1925'an de li gundê Kulliceya Bokanê wekî zarokekî malbateke xizan hat dinê. Adullazade qet bavê xwe nedît û di 6 saliya wî de dayika wî diçe ber rehmê. Di zaroktiya xwe de dest bi jiyaneke zor û zehmet dike. Tê bîra wî nayê bîra wî her tim şivanî kir. Di zaroktiya xwe de eleqe nîşanî bilûrê da. Ewqas ji bilûrê hez dikir ku ji ber hezkirina bilûrê qet nezewicî. Dema ji wî dipirsîn 'Çima nazewicî?' wî bersiva "Ez dixwazim li bilûrê bidim û dixwazim bi bilûra xwe ve biçim her derê. Dixwazim bi helbestan ve xizmetî gelê xwe bikim." dida. Ew helbestvan e jî. **BOKAN**

# Mêvan ji Çadira Ziman kêm nabin

Parlamentera DTP'ê ya Wanê Fatma Kurtulan di roja dawî de Çadira Ziman a bi boneya Cejna Zimanê Kurdî hatiye vekirin ziyaret kir.

Serdanên Çadira Ziman a Şaxa KURDÎ DER'a Wanê bi boneya Cejna Zimanê Kurdî vekirî, berdewam dikin. Parlamentera DTP'ê ya Wanê Fatma Kurtulan, Rêveberê Navenda Giştî ya DTP'ê Salîh Yildiz, Şaredarê Wanê Bekîr Kaya, rêveber û endamên DTP'ê, Çadira Ziman ziyaret kir. Parlamenter Kurtulan, Şaredar Kaya û Salîh Yildiz, her yekî pirtûkek nivîskarê Kurd Hemîd Dilbihar a bi navê 'Piştî Tu Çûyî' ku ji Weşanxaneya Aramê derketiye bi Dilbihar da îmzekirin.

**Li Gihadînê panel**

Li Navçeya Gihadînê ya Agiriyê jî li Pasaja Kovalarê li ser zimanê kurdî panelek hate lidarxistin. Ji aktîvîstên TZPKurdî Çetîn Taş û Abdullah Kaya wekî panelîst beşdar bûn. Di nava wan de Şaredarê Diyadînê Celal Tanriverdî, Serokê Rêxistina DTP'a Navçeyê Abdullah Tunç jî heyîn gelek kes beşdarî panelê bûn. Ji bo şehîdên demokrasiyê rêz hate girtin. Piştre panelîst Abdullah Kaya mafê axaftinê girt û bal kişand ser pêkutiyên li ser zimanê kurdî. Kaya, diyar kir ku bi salan e li ser zimanê kurdî polîtîkayên asîmîlasyonê tên meşandin. Kaya, bang li gel kir ku xwedî li zimanê xwe derkeve. Piştre, Çetîn Taş, der barê dîroka zimanê kurdî û rewşa niha de agahî da. Taş, destnîşan kir ku her çiqas zimanê kurdî berfireh û dîrokî ye jî ji ber polîtîkayên pêkûtî û asîmîlasyonê li ser tê meşandin, zêde pêş neketiye. Panel, bi bangewaziya mela Îkram Bîrgul a ji bo parastina kurdî bi dawî bû. **WAN / AGIRÎ**

Sersaxî



Kadrî Gokdere
1957 - 2009

Em li ser navê hemû hevalên mamoste KADRÎ GOKDERE sersaxiyê ji xizm, dost û hevalên wî re dixwazin. Em hêvî ji xwedayê dilovan dikin ku wî bi rehma xwe şad bike û cihê wî buhişta baqî be.
Em soz û peymanê didin hevalê xwe ku em ê riya wî dewam bikin û ji kaniya berxwedana wî daxwazên gelê xwe av bidin.
Bila rewanê te aram be hevalo heta kêlîka dawî ji jiyana xwe em ê li ber xwe bidin.

Bi navê hemû hevalên KADRÎ GOKDERE yên...

Şaxa KESK'ê ya Amedê

# Ji bo mala çandê şahiya piştevaniyê

Li gundê Tatanê yê Gimgima Mûşê, ji bo avakirina Mala Çandê ya Tatanê şahiya piştevaniyê hate lidarxistin.

Welatiyên gundê Tatana navçeya Gimgimê ji bo bingeh avêtin û danasîna Mala Çandê ya Tatanê şahiya piştevaniyê li dar xist. Di şahiya ku li Mala Çandê ya Pîr Sûltan Abdal a Gimgimê pêk hat de, Şaredara Gimgimê Gulşen Deger, Rêveberên DTP'ê yên Gimgimê jî di nav de bi sedan kes amade bûn. Di şahiyê de hate xwestin ku her kesê çandê diparêze piştgiriyê bidin Mala Çandê ya Tatanê.

Di şahiyê de Sekreterê Giştî yê Komeleya Alîkarî û Çanda Guzelkent Velî Beyazgul axivî û diyar kir ku piştî wan di 31'ê tebaxa sala 2008'an de bingeha mala çandê avêtin coşeke mezin pêk hat. Beyazgul, diyar kir ku warên çandî û civakî piştevanî û şêwirmendiya di nava gundên cîran de jî xurt dike. Gundiyên Tatanê wekî çavên xwe li vê mala çandê xwedî derketin. Welatiyên gund ên li derveyî gund jî bi coşeke mezin piştgirî dan vê projeyê. Me bi derfetên pir hindik dest bi avêtina bingehê vê avahiyê kir. Lê belê dîsa jî em dixwazin her kes li gorî derfetên xwe piştgiriya xwe bidomîne."

Piştre Şaredara Gimgimê Gulşen Deger jî anî ziman ku vê projeyê di nava gund û navçeyê de coş û peroşiyek ava kiriye û kesên keda wan ketine nava projeyê pîroz kir. Deger, anî ziman ku tifaq, yekîtî û biryar hemû pirsgirêkan çareser dike û hêza herî mezin e. Piştî axaftinan şahiyê bi temaşekirina slayt û guhdarkirina helbestan dom kir. Şahî bi konsera Burhan Karakaş, Mustafa Tural, Ahmet Karakaş, Kerem Ekdag û Yildirim Beyazgul bi dawî bû. **MÛŞ**

# Amadekariya mîtînga jinan didome

## Tevgera Jinan a Azad û Demokratîk li hemberî polîtîkayên neçareserkirina pirsgirêka kurd û êrîşên li ser jinan dê nerazîbûnên xwe bi slogana "Lihevhatina Jinan a Aştiyê" li parka Ekîn Cerenê mîtîngekê li dar bixin

Seroka Komeleya Jinan a SELÎS'ê Sudan Guven, destnîşan kir ku li hemberî hêzên ku nahêlin pirsgirêka kurd bê çareserkirin û li hemberî êrîşên li ser tevgera jinan tên meşandin dê di 31'ê gulanê de mîtîngekê li dar bixin. Guven, destnîşan kir ku ji her aliyê Tirkiyeyê li bendê ne ku siyasetmedar, hunermend, ronakbîr û nivîskarên jin, tevli mîtîngê bibin.

Beşdarên Tevgera Jinan a Azad û Demokratîk (DOKH), dê bi slogana "Lihevhatina Jinan a Aştiyê" di 31'ê gulanê de li Parka Ekîn Cerenê mîtîngê li dar bixin. Di civîna têkildarî mijarê li avahiya DTP'ê ya Amedê pêk hatî de seroka Komeleya Jinan a SELÎS'ê Sudan Guven, destnîşan kir ku li hemberî polîtîkayên neçareserkirina pirsgirêka kurd û êrîşên li ser tevgera jinan dê nerazîbûnên xwe bînin ziman û wiha axivî: "Di mîtîngê de nîqaşên pirsgirêka kurd, biryara PKK'ê ya heta 1'ê hezîranê, li dijî hêzên ku naxwazin pirsgirêk bê çareserkirin, li dijî şîdeta civakî, taciz, tecawiz û polîtîkayên asîmîlasyonê bînin ziman.

Her wiha dê di mîtîngê de bêjin 'Gotinên ku em bêjin ji hene. Hêza me ya ku çareseriyê pêş bixe heye.' Me bangî hemû jinên siyasetmedar, hunermend, nivîskar kir ku beşdarî mitîngê bibin."




Guven, diyar kir ku amadekariyên mîtîngê didomînin û wiha axivî: "Di çarçoveya amadekariyên mîtingê de 15 hezar belavok û afîş jî hatin amadekirin. Amadekariyên mîtîngê ber bi dawiyê ve diçin." **AMED**

# Tehamulî serkeftina DOKH'ê nekirin


Şefika Gurbuz


Gunes Çelik


Hulya Osmanagaoglu

Nûnerên saziyên jinan ên sivîl û civakî bertek nîşanî girtina endamên Tevgera Jinan a Azad û Demokratîk (DOKH) da û diyar kirin ku girtina endamên DOKH'ê antî demokratîk e. Jinan anî ziman ku hikûmeta AKP'ê serkeftina DOHK'ê tehamul nekiriye û dest bi girtinan kiriye.

Endama Komeleya Jinan a Kesksorê Şefîka Gurbuz, diyar kir ku piştî DTP'ê di hilbijartina 29'ê adarê de serkeftineke mezin bi dest xist, dewletê dest bi êrîşan kiriye. Gurbuz, destnîşan kir ku dewletê serkeftina DTP'ê tehamul nekiriye û wiha got: "Ji ber ku şaredariyên herêmê ketin destê DTP'ê hikûmetê û dewletê ev yek qebûl nekir. Jinan di vê xebatê de erkeke girîng list. Ji ber vê yekê dewletê di destpêkê de berê êrîşa xwe da xebatkarên jin. Lê belê bi van êrîşan pirsgirêka kurd çareser nabe. Ger ku Serokomar peyamên ji bo çareseriya kurd dide, divê li hemberî vê yekê endamên DTP'ê û DOKH'ê serbest werin berdan. Ger ku hikûmet gavên demokratîk neavêje dê dîsa kuştin pêk were, xwîn û rondik birijin."

**Ji jin û kurdan ditirsin**

Seroka Sendîkaya Karkerên Konutan a Genel-İş'ê Nebîle Irmak jî anî ziman ku pirsgirêka betaliyê ji neçareseriya pirsgirêka kurd e. Irmak, diyar kir ku jinên kurd di tevgera jinên Tirkiyeyê de cih û erkeke pir girîng dilîzin û wiha got: "Jinên kurd ji rêxistinkirinê heta perwerdekirinê di hilbijartina herêmî û giştî de rola xwe lîst û vîna xwe derxistin holê. Ji ber vê yekê pergal ji hêza jinên kurd ditirse. Ji ber ku pergal ji jinan û kurdan ditirse dest bi êrîş, binçavkirin û girtinan kir." Irmak, girtina jinan şermezar kir û piştgiriya xwe anî ziman.


Ji Komeleya Kolektîfa Femînîstên Sosyalîst Hulya Osmanagaoglu jî bal kişand ser bêtehamuliya AKP'ê ya serkeftina jinê û daxuyand ku DTP'ê serkeftinek bi dest xistiye û piştre êrîşan dest pê kiriye. Osmanagaoglu, wiha axivî: "Gelê kurd dizane ku wan kî hilbijartiye û kî wan temsîl dike. Endamên DOKH'ê di rêxistina jinên kurd de roleke girîng lîst. Ji ber vê yekê bûn navenda êrîşan. Divê hemû tevgerên jin ên demokrat piştgiriyê bidin."

**Êrîşê şermezar dikin**

Endama EHP'ê Guneş Çelîk, destnîşan kir ku dewlet bi girtin û êrîşan bersivê dide serkeftina kurdan û êrîşên li ser kurdan û jinan şermezar kirin. Endama Meclisa Jinên Bajêr ên DTP'ê Ulker Ozatîk, jî bang li hemû jinên demokratîk û aştîxwaz kir ku û xwest ku piştgiriyê bidin girtiyan. Ozatîk, wiha got: "Girtina jinan êrîşeke keyfî û derhiqûqî ye. Em van girtinan qebûl nakin û şermezar dikin. Em dê bi çalakiyên xwe bertekên xwe zêde bikin."

Edîtora Komeleya Jinên Azad Serpîl Kemalbay jî anî ziman ku di pêvajoya hilbijartinê de bi jinên girtî re xebat meşand û wiha dom kir: "Di serkeftina jinê de jinê roleke mezin lîst. DTP cûdatiya erênî li ser jinan pêk tîne. Her wiha ji bo biratî, wekhevî û aştiya Tirkiyeyê têkoşînê dimeşîne. Ez girtina jinên kurd ku siyasetek çalak meşandin şermezar dikim. Ev girtin êrîşa li ser demokrasî û mafên mirovan e. Em dixwazin hevalên me zûka serbest bêne berdan." **STENBOL / DÎHA**

# Li girtîgehê îşkenceya lêgerînê


Asya Kar

Jinên bi armanca hevdîtina xizmên xwe diçin Girtîgeha Tîpa E ya Mêrdînê rastî pêkanînên nemirovî tên. Hate zanîn ku jin bi hinceta, "Lêgerînê" tên tazîkirin, gelek caran didin rûniştandin û radikin ser piyan. Hate zanîn ku jinên pêkanînê qebûl nakin ji nikarin bi xizmên xwe re hevdîtinê pêk bînin.

Nafiye Kuçuk (35) diyar kir ku çiqas diçe hevdîtina kurê xwe nêzîk du saetan rastî lêgerînê tê. Kuçuk diyar kir ku ji ber van pêkanînan nikare kurê xwe bibîne û ev tişt gotin: "Ji bo mirovan bêzar bikin serî li van rêbazan didin. Di dema lêgerînê de hemû kincên me derdixin. Me dibin pişt perdeyekê. Li vir ligel ku em tazîne jî wezîfedarek li her derê me dinêre. Me tacîz dikin. Gelek caran bi awayek tazî me didin rûniştandin û rakirin. Gelek jin bi boneya vê tacizê qebûl nakin, nikarin xizmên xwe bibînin. Ev pêkanîn rûmeta mirovan binpê dike. Ev rûreşiyeke mezin e. Dixwazin mirovan bêzar bikin. Dema em îtîraz dikin jî me hilnadin hundir. Bi saetan me li ber derî dihêlin. Lê ew bikin jî ji bo dîtina zarokên xwe yên bêsûc em dê biçin girtîgehê. Lazim e dewlet di zûtirîn demê de dawiyê li vê pêkanînê bîne. Dixwazin me jî wekî zarokên me yên bêsûc ceza bikin."


Nafiye Kucuk

**'Tacîzê dikin'**

Ayşe Kar (37) anî ziman ku zarokên wan ên di pûçolkê de jî rastî lêgerînê tên û wiha domand: "4 saet dema hevdîtinê heye lê saetek bi lêgerînê diçe. Dewlet bi van pêkanînan dixwaze mirovan rencîde bike. Hefteya borî bi sedan jin hatin tazîkirin. Li ser vê yekê ez çûm cem midûrê girtîgehê. Midûr gef li min xwarin û ez ji odeyê derxistim. Ji ber dîtina zarokên xwe em neçarî van pêkanînan qebûl dikin. Ku ev pêkanîn berdewam bikin, em dê serî li çalakiyên cuda bidin. Her wiha polîs her tim bi ser malbatên girtiyan de digirin. Dewlet wekî dijminan li me dinêre."

**'Ji ber em kurd in wisa dikin'**

Asya Kar (45) jî derbirî ku piştî tên tazîkirin wezîfedar tevahiya bedena wan dinêrin û dest didin wan. Kar wiha got: "Bi van lêgerînan rûmeta me binpê dikin. Zilmê li me dikin. Ji ber ku em kurd in, van pêkanînan li ser me dimeşînin. Em nikarin xwarin û vexwarinekê an jî kincekê ji zarokên xwe re bibin. Ji ber ku tiştek li gorî xwe jê guman bin, me hilnadin hundir. Em van pêkanînan şermezar dikin. Em dê heta dawiyê li hemberî vê yekê derkevin." **ŞIRNEX**

# Ceza dan

Li Girtîgeha Jinan a Karataşê ku ev salek e bi binpêkirinên mafan li rojevê nakeve li girtiyên siyasî salek cezayê qedexeya hevdîtina vekirî û mehek jî cezayê qedexeya hevdîtina girtî hatiye birîn.

Li Girtîgeha Jinan a Karataşê binpêkirinên li hemberî girtî û hikumxwarên siyasî didomin. Berî niha bi 3 mehan girtiyan teşebûsa gardiyan ku xwestibûn piştî hevdîtina vekirî girtiyan li koridorê tazî bikin û lêgerîn pêk bînin şermezar kiribûn. Li girtî û hukmxwarên jin ên ji bo vê rewşê şermezar bikin li derî û mazgalan dan ceza hate barandin.

Girtîgeha Karataşê di nava salek dawî de bi gelek binpêkirinên mafan, pêkanînên kêfî, 'lêgerîna zirav', qertên li ser wan 'teror' nivîsî, mahrên 'yek millet, yek al, yek welat' hate rojevê. Girtiyên ku li hemberî van pêkanînan derketin jî rastî ceyên qedexekirina hevdîtinê hatin.

Hin nameyên ji İHD'ê re hatin rêkirin bêyî tu hinncet bê nîşandan hatin desteserkirin, axaftina kurdî hate astengkirin. Ji bilî van pêkanînan Girtîgeha Karataşê bi gelek bipkêkirinên din jî hatibû rojevê. **EDENE**

# BÎRANÎN


Osman Arslan (2002)

*Dost*
*Ez di hucra xwe ya tarî de*
*Her roj cihekî cîhanê dijîm*
*Belkî tetîk bikeve*
*Çekên me tune ne*
*Lê qasî evîna me ye*
*bedena me*
*Ku li ber işkencê ye*
*Û qasî namlûyê jî*
*Soza me heye*
*Her roj bi silavên rojê*
*Em hesinan dihelînin*

*Di sersala şehadeta wî ya 8'emîn de em bi rûmet bi bîr tînin.*

**Li ser navê malbata wî birayê wî Ahmet Arslan, dayika wî û lawê wî Garîp**

# Berpirsiyar dewlet e

Platforma Demokratîk a Jinan a Eskîşehirê bi daxuyaniyê êrîşa li hemberî Y.A'ê ya li Giyadîna Agiriyê şermezar kir û diyar kir ku rayedarên dewletê berpirsiyariya xwe bi cih neaniye. Platforma jinan destnîşan kir ku qetilkirina jinan bi navên cuda cuda didome. Platformê bal kişand biryara malbatê a der barê kuştina Y.A. yê û got ku Y.A alîkarî ji rayedarên dewletê xwest lê rayedarên dewletê piştî demekê bi destê xwe ew teslîmî hevserê wê kiriye û ew bûne sedema birîndarkirina wê. Platforma jinan, da zanîn ku di bûyerê de berpirsiyar dewlet bi xwe ye û daxuyaniyê wiha dewam kir: "Dewlet her tim şîdeta mêran a li hemberî jinê meşrû dike. Kujer û sûcdar bi qanûnan tên parastin. Ev bûyer ne ya yekem e û ne jî dê bibe ya dawiyê." **EskîŞEHÎR**

www.arsivakurd.org

Hawar
23 Gulan 2009 Şemî

# Di mehên havînê de rêbazên xwezayî tercîh bikin



**Havînê ji ber bandora germahiyê gelek nexweşî û bûyer diqewime. Serokê Şaxa SES a Amedê Mehmet Antmen der barê bandora germahiyê de gel hişyar kir û got ku bêyî doktor derman nekirin**



Serokê Şaxa SES'a Edeneyê Doktor Mehmet Antmen diyar kir ku bi germahiya hêwayê re nexweşiyên wekî emel, ferşî û enfeksiyona rûvîkan di nava gel de zêde dibe û her wiha Antmen anî ziman ku bila welatî bêyî doktor ji dermanxanan derman negirin. Antman wiha dirêjî da axaftina xwe: "Ev rewşeke gelek xeter e. Gelek caran ev rêbaz di zarokan de bûye sedeman xetimîna rûvîkan û bi mirinê encam dibe."

Serokê Şaxa SES'a Edeneyê Mehmet Antmen der barê bandora germahiya hewayê de axivî û welatî hişyar kirin. Antmen destnîşan kir ku bandoreke neyînî li ser mirovan dike û her wiha dibe sedema nexweşiyên wekî emel, ferşî û enfeksiyona rûvîkan. Antemen da zanîn ku bi taybetî divê zarok û pîr di navbera saetên 11 û 16 'an de dernekevin derve. Antmen wiha pê de çû: "Havînê bi taybetî welatî ji bo ku pêşiyê li nexweşiya emel bigire bêyî doktor diçin ji eczaneyan derman dikirin. Nexweşiya bi emelketinê bi giştî sedema wê bêavbûn û virûs in.

Ji ber vê yekê ew çi derman dibe bila bibe û bi taybetî dema ku bê doktor derman bê bikaranîn, rewşeke gelek talûke ye. Ev rêbaz di zarokan de dibe sedema xetimîna rûvîkan. Heta mirinê jî diçe. Emelê ku havînê mirov pê dikevin bi rêbazên xwezayî derbas dibin û divê mirov van rêbazan tercîh bikin. Ji van rêbazan ya herî girîng ev e ku divê mirov zêde avê vexwin. Vexwarina avê hem mirovan ji germahiyê diparêze û hem jî tedawî dike. Her wiha ji bo ku av ji laş bê girtin divê dewê şor, şorbe û şîr jî bê vexwarin. Ev made hemû ji bo ku av ji laş bê girtin gelek baş in."

**Bandora germahiyê**

Antmen der barê germahiyê de axivî û diyar kir ku li Edeneyê ji ber germahiyê gelek kes di avê de dixeniqin û ji xaniyan de dikevin. Antmen wiha berdewam kir: "Ev du rewş rê li mirinê vedikin. Li Edeneyê li nava taxan cuhên avê hene. Ji bo ku zarok nekevin van avan divê rayedar der barê vê mijarê de çareseriyan pêk bîne. Çareserî tenê qedexe nîn e. Li taxên xizan û cihên ku zarok lê zêde ne divê çalakiyên hewzan pêk bên. Ji bo hênikbûnê divê hewzên paqij û bê talûke bên çêkirin. Bi van rêbazan dê pêşî li van talûkeyan bê girtin. Her wiha havînê gelek kes ji ber germahiyê ji ser xaniyê radikevin. Bi taybetî her sal gelek zarok ji xaniyan dikevin û dimirin. Ji bo vê jî divê derdorên xaniyan bê sînorkirin. Teqez divê dora xaniyan bê bilindkirin." **EDENE**

# Koça Qijikên Çolê dest pê kir



Nifşê çûka bi navê Qijika Çolê bi tunebûnê re rû bi rû ye û rêwîtiya wan a navçeya Bîrecîka Rihayê dest pê kir.

Qijika Çolê tenê li Ewropa û li Tirkiyeyê li Rihayê tê dîtin. Her wiha rêwîtiya wan a ji Rihayê dest pê kir. Qijika Çolê wekî çûkên koçber her sal di mehên biharê de tenê tên Rihayê û heta serê payîzê li wê herêmê dimînin. Nûnerên Komeleya Xwezayê îsal di çarçoveya xebata erdan de dîmenên Qijika Çolê kişandin. Berpirsê Komeleya Xwezayê ya Rihayê Turan Çetîn diyar kir ku ev 4 sal e ji bo ku nifşê Qijikên Çolê zêde bibin û kesên ku ji bo serdana vir tên wan bibînin xebatan dimeşînin. Çetîn wiha dirêjî da axaftina xwe:

"Ya herî girîng ev e ku kesên ku li vir dijîn, yanî gelê vir divê wan biparêzin û xwedaniyê lê bikin. Xebatên endamên Komeleya Xwezayê ji bo ku Qijikên Çolê bên parastin xebatan didomînin.

Qijika Çolê (Cursorîus cusor) li hemû Ewropayê pir kêm tê dîtin. Li herêma me jî li navçeya Bîrecîka Rihayê tê dîtin. Bi hatina biharê re Qijika Çolê koçî Bîrecîkê dikin û heta dawiya havînê li wir dimînin. Wekî ku ji navê wê jî tê zanîn ew li çolê dijîn û tenê gava raberî talûkeyekê dibin difirin. Ji bo jiyana Qijikên Çolê deşta Bîrecîkê qadeke gelekî girîng e. **RIHA**

# Li Elkê demsala masiyan



Li navçeya Elkê ya Şirnexê, bi hatina demsala biharê, sezona masiyan ya herî bi berhem çêdibe.

Li navçeya Elkê ya Şirnexê, bi hatina demsala biharê û ji ber helîna berfê û zêdebûna ava çeman rûyê masîdaran dikene. Masîdarên ev yek wekî fersend dîtin bi serpmeyan dest bi girtina masiyan kirin. Masîgir ku ji ber hişkesaliyê di sala borî de masî negirtin, îsal ji ber zêdebûna masiyan keyfxweş in. Gelek masîdar ji ber ku li Çemê Faraşînê masî zêde ne ji bo vê tên devera çem di nav navçeyê de derbas dibe. Masîdarên amator bi hev re dikevin nava pêşbirkê. Masîdaran diyar kirin ku ji ber krîza aborî ya heyî goştê sor nikarin bikirin û ji ber wê jî tên girtina masiyan ku goştê spî dibin malên xwe. Masîdaran anîn ziman ku rojê nêzî 6 kîlo masiyan digirin û hindik be jî difroşin û alikariyê didin debara mala xwe." **ŞIRNEX**

# *Ji bo jiyaneke dirêj fêkiyên herî baş*

Kesê ku dixwaze zêde bijî teqez divê van fêkiyan bixwe. Li Amerîkayê kesê bi navê David Murdock (85) diyar kir ku tu pirsgirêkeke wî ya tenduristiyê tuneye û her wiha got ku xwe pir ciwan hîs dike û hedefa wî ev e ku 125 salan bijî. Murdock çend sal berê Navenda Lêkolîn a North Carolîna ava kir. Murdock 1.5 mîlyar dolar fon ji bo pisporan razand û xwest ku li ser jiyaneke dirêj û extiyariyê lêkolînan bimeşînin. **AMED**

*Di encama lêkolînê de encamên ku hatin bidestxistin wiha ne;*



*Sêv; Ji nexweşiyan diparêze. Ji pençeşêra prostat û pişikê diparêze. Rîska nexweşiya alzheimer kêm dike.*



*Ananas; piştî amelyatê pêvajoya başbûnê lezgîntir dike, monikan baş diparêze û pêşî li astimê digire.*



*Spanax; mejî bi hêztir dike. Ji pençeşêra kezaba reş û prostatê diparêze. Di warê xurekî de jî gelek dewlemend e.*



*Îsota sor; Ji pençeşêra, prostat û malzarokê diparêze. Li dijî şewitandina rojê bi bandor e. Ji bo tenduristiya dil bi fêde ye.*



*Brokolî; Xesara ku diyabet dide laş kêm dike. Ji pençeşêra prostat, mesane, kolon, pankreas, memik û midê diparêze. Di rewşên birîndariyê de mejî diparêze.*



*Bacana sor; Îltîhaba vucut diparêze. Pençeşêra boriya xwarinê, mîde, rêvî, pişik û pankreasê di parêze. Rîska krîza dil di parêze.*



*Dirinermk; Hestiyan qaîm dike. Dohnê laşî dimeyine.*



*Roqa ; qusûrên ku bi welîdinê re peyda dibin, kêm dike. Talûkeya şikestina hestî kêm dike. Ji bo çavan baş e.*



*Alûce; Ji qebzê diparêze. DNA'ê diparêze. Piştî menopozê hestiyan qaîm dike.*

*Kundirê şîrîn; Çerm û dil diparêze.*

*Petêx; Ji nexweşiyê diparêze. Li dijî rojê çerm diparêze. Laş ji iltîhabê diparêze.*



*Gêzer; DNA'yê diparêze. Katarakê diparêze. Ji gelek pençeşêran diparêze.*

www.arsivakurd.org